Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1252 | 2-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Hilêliyê kevintirîn tax li bajarê Qamişlo ye

Hêvî Keleş/Qamişlo

**Taxa herî kevnar li bajarê Qamişlo taxa Hilaliyê ye, ev tax li ser girekî ku li ber deriyê Rojavayê bajêr dikeve. Tax ji hêla kesekî ji malbata Abû Eyşek yê bi navê Elî Yûsif ve hatiye avakirin. Herwiha avakirina wê vedigere salên pêşîn ên avakirina bajêr.**





Hilêliyê kevintirîn tax li bajarê Qamişlo ye, ev tax ji hêla xaniyên xwe yên kevin û kolanên xwe yên bi derence ve tê naskirin. Dîroka avakirina wê vedigere salên pêşîn ên avakirina bajêr ji sala 1928`an de. Yekem kes ku xanî li wir ava kir, kesê bi navê Elî Yûsiv ku ji malbata Abû Eyşek e. Sedema navlêkirina Hilêliyê, ew bû ku dema temambûna avakirina taxê şiklê hîlal derket.

Di derbarê dîrok û avakirina Taxa Hilêliyê ya bajarê Qamişlo neviyê Elî Yûsif û mamosteyê Erdingarî Farûq Yûsif ji rojnameya me re axivî.

### Avakirina taxa Hilêliyê

Farûq Yûsif da zanîn ku taxa Hilêliyê gund bû û li kêleka bajarê Qamişlo bû û wiha got: “Yê yekemîn hat û xaniyek li Hilêliyê ava kir bapîrê min Elî Yûsif bû. malbata wî bi xwe ji Nisêbînê ne û erdê wan ji Nisêbînê heta bajarê Amûdê dirêjkirî ye. Roja ku xet lêxistin û sînor tesbît kirin û cumhuriyeta Tirkiyê çêbû, bapîrê min got divê ku hin ji me li ser xetê bin û hin li bin xetê bin, hin ji me vî erdî dorber bike û yê din erdê li Nisêbînê dorber bike. Çareseriya wan ew bû ku birayê xwe Elî bişînin vir. Di Sala pêşî dema hatin di konan de bûn cihên wan yê sabît tune bû, yê ku li cihê xwe sabît diman wan dagir dikirin, ji ber wilo berê xwe dan Til Afer û demekê li wir bicih bûn. Piştre Elî vedgere Hilêliyê û xaniyekî ava dike û alîkarê wî hebûn yê ku cot dikirin û yên lawirvanî dikirin. Tê texmînkirin ku xanî piştî 1925`an de hat avakirin. Herwiha ji cotkaran re jî cihekî ava dike weke hewşekê. Têkiliya Elî Yûsiv bi Haco Axa re hebû û wî wê demê jê xwest ku dehpanzdeh malbatan bide wî Ji ber ku ew bi tenê bû û gund ji aliyê kesekî ve nayê avakirin, wek ku wî wextî got, ji ber vê yekê donzdeh malbatên Xiristiyan alîkariya wî di avakirinê de kirin. Hilêliyê gund bû lê bi demê re bû taxek ji taxên Qamişlo, hejmarê xelkên ku roja îro de têde dijîn zêdetirî 12 hezarî ye.”

### Sedema navlêkirina taxê

Yûsif diyar kir ku Helaliyê di Nîsana 1929`an de hatiye avakirin û wiha got: “Min ev agahî ji xalê xwe bihîstiye. Elî ew mirovekî hişmend bû ku bi dîrokê re eleqedar bû. Ew dibêje, piştî ku wan karê roja sêyem a avakirinê qedand heyvê wek hîlal dîtin. Lewma biryar dan ku navê vê taxê bikin Hilêliyê, ji ber ku li ser vê pîroziyê çêtir tiştek tune ye. Hilêliyê bi ava xwe navdar bû û çemek ji rojavayê Nisêbînê derdiket, di heman demê de sê çem ji vir diçûn gundê Hîmo, ev yek jî li ser riya sereke, ku sê pirên biçûk lê hene, xuya dibe. Ji vir heta Qamişlo çemekî bi navê Xiniz hebû ku ji binê Wadî Hilaliyê derbas dibû û pira wê îro jî li ser kargeha Rojava heye.”

### Hejarbûna Hilêliyê

Neviyê Elî Yûsif û mamosteyê Erdingarî Farûq Yûsif axaftinên xwe wiha bi dawî kir û wiha got: “Dedrora bajarê Qamişlo gund bûn, Enteriyê û Hilko û Hilêliyê jî yek ji van gundan bû di van cihan de kesên hejar jiyan dikin. Enteriyê û Hilko hatin avakirin piştî ku hîzam çêbû, parêzerê wê demê bi navê Sibhî Herib tê Enteriyê konekî vedike û erdan dide xelkê. Dema berê xwe daye Hilêliyê li wir Jî konekî vedike lê xelkên Hilêliyê xaniyên xwe xeranekirin û ji ber wilo Kolanên wê gelekî berfireh nebûn û nebû wek bajar, lewma man xaniyên kevin. Herwiha Enteriyê bû bajar lê Hilêliyê nebû ji be ku xelkên Hilêliyê wek xelkên Enteriyê bi Sibhî Herib re nebûn alîkar û nehiştin kolanan veke. Piştî wê bi demê re tevger lê çêbû lê ji be ku Hilêliyê li kêleka bajêre, hejarên ku koçber bûne lê pir in, tevî ku tevger lê çêbûye û kedkar lê hene û pir in, lê maye cihê hejaran. Sedema sereke ew e ku çêkirina kolanan dereng ma, lewra kolanên Hilêliyê man weke gund.”

Sudoku: Bersiv 29

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 9 | 3 | 6 | 8 | 5 | 2 | 1 | 4 |
| 1 | 2 | 5 | 3 | 7 | 4 | 6 | 8 | 9 |
| 6 | 4 | 8 | 1 | 2 | 9 | 5 | 7 | 3 |
| 9 | 7 | 4 | 2 | 6 | 1 | 3 | 5 | 8 |
| 8 | 5 | 1 | 7 | 9 | 3 | 4 | 6 | 2 |
| 3 | 6 | 2 | 5 | 4 | 8 | 7 | 9 | 1 |
| 4 | 1 | 7 | 8 | 5 | 2 | 9 | 3 | 6 |
| 5 | 8 | 9 | 4 | 3 | 6 | 1 | 2 | 7 |
| 2 | 3 | 6 | 9 | 1 | 7 | 8 | 4 | 5 |

Sudoku:Pirs 30

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | | | | | | | 2 | |
| | 7 | 1 | | 6 | | 5 | 9 | |
| | | 6 | | 7 | | | | 8 |
| 2 | 3 | | 6 | | 5 | | | |
| | 9 | | | | | | 5 | |
| | | | 3 | | 7 | | 1 | 2 |
| 3 | | | | 5 | | 7 | | |
| | 1 | 4 | | 3 | | 2 | 6 | |
| | 8 | | | | | | | 5 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Keviran girê didin kûçikan berdidin:**
- Newekhevî heye; derfetan didin hina, pêşiya hina digirin.

**Kî dike kî dixwe:**
- Hin dixebitin yên din jî ji xebata wan sûdê digirin.

**Kî dixwe kî li xwe dixe:**
- Bi heman wateyê.

**Ma ga dike ga dixwe:**
- Bi heman wateyê.

**Rehta kiro, rihet xwaro:**
- Yên bixîret dikin, yên tiştekî nakin dixwin.

LI SER HESNEKIRINÊ

**Apê Xidir e, her roj li vir e:**
- Dema yek pir diçe cihekî lê xwediyê cih nexwaze hingê dibêje.

**Beqa reş pê ve vereşiyaye:**
- Jê nayê heskirin; derdorên wî jê hes nakin.

**Bikeve zikê wî wê xwe biavêje avê:**
- Jê hes nake; pir rika wî jê diçe.

**Bi serê pozê xwe diaxive/bi serê pozê xwe pê re diaxive:**
- Jê hes nake; keyfa wî jê re nayê.

**Bi şev şemamok e, bi roj pîrevok e:**
- Mêr bi tinazî ji bo jina xwe dibêjin.

**Çavreşî avêtiyê:**
- Li ber çavê wî reş bû; êdî jê hes nake.

**Çîtika wî reş e:**
- Jê nayê heskirin; derdorên wî jê hes nakin.

**Du parsek li ber deriyekî nabin:**
- Kesên heman tiştî ji deverekê dixwazin ji hev hes nakin.

**Dilê min jê reş bû:**
- Ez êdî nikarim bixwim.
- Ez êdî naxwazim bibînim.

**Ez hervoşka bidohn im, zû ji min têr dibin:**
- Dema hin ji hevaltiya yekî hes nekin hingê dibêje.

**Jê çavreş bû:**
- Li ber çavê wî reş bû; êdî jê hes nake.

**Ji ber çavê min ket:**
- Êdî ez jê hes nakim.

**Ji çavê min ket:**
- Bi heman wateyê.

**Ji destê wî pêsîra xwe dadiweşîne:**
- Jê hes nake; naxwaze bibîne.

**Li ber çavê wî reş bûye:**
- Êdî jê hes nake; naxwaze pê re bijî; naxwaze bibîne.

**Li ber çavê wî bûye marê reş:**
- Bi heman wateyê.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## ‘Yên ku roja me tarî bikin, nikarin pêşeroja xwe bibînin’



Welatparêzê kurd Nisredîn Xelîl yê ku gelek caran Rêber Apo dîtiye û li gel wî maye, anî ser ziman ku nêrandinên Rêber Apo jî bi serê xwe perwerde ye û wiha got “Rêber Apo bi ramanên xwe gel da fêmkirin ku Kurdistan heye û pêwîst e bê rizgarkirin.”**R-6**

## ANHA; 12 sal in ku ji heqîqetê re rêwîtiyê dike

Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) 12 sal in rêwîtiya xwe di nava têkoşîn, ked û berxwedanê de dike, da ku bi xebatên xwe yên pîroz rastiya ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li cîhanê diqewime, ragihîne.**R-5**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1252 | 2-Adar-2025 | www.ronahi.net/ku/
Nirx: 500 L.S




## Akademiya Şehîd Yadê Eqîde ji bo pêşxistina pîşeyên civakê ye

Hemehengiya Meclisa Edaleta Jin beşê Akademî û Şopandinê Newroz Eseid diyar kir ku Akademiya Yadê Eqîde bi rêya perwerdeyan, hizir û pîşeyên civakê pêş dixe û got, “Armanca me ji perwerdeyên hizirî û pîşeyî ew e ku demên vala yên civakê ji holê rakin.”**R-2**



## Ji çiraxên hunera kurdî

Hunermend, bestekar û nivîskarê kurd Mihemed Elî Şakir piştî karekî hunerî dewlemend ku bi gelek stran û awazan tijî bû, ji ber nexweşiya Koronayê di 2020’an de koça dawî kir.**R-7**



**Abdullah Ocalan şensê aşitiyê dide!**
Mihemed Seydî R-4



**Berpirsiyariya Dîrokî Xurtkirina Destê Rêber Apo Ye**
Idrîs Henan R-5

# BANGA RÊBER APO RÊYA ÇARESERIYÊ YE

Bi navê ‘Banga Aştî û Civaka Demokratîk’ di 27’ê Sibatê de Rêberê Gelan Abdullah Ocalan bangeke dîrokî ji bo raya giştî kir. Banga Rêber Apo li seranserî cîhanê deng veda û gelek partî, sazî, tevger û dewletên cîhanê piştgiriya xwe jê re ragihandin. Komîteya Rêveber a PKK’ê jî têkildarî banga Rêber Apo daxuyaniyek da. PKK’ê diyar kir ku banga Rêber Apo rêya hemû hêzên azadî û demokrasiyê ronî dike û got, “Ji îro û pê ve em agirbestê radighînin.”**R-3**






## Trump hewldana rawestandina şerê Rûsya û Ukraniya dike!?

Di 24’ê Sibata 2022’an de Rûsya dest bi êrişên ser Ukranyayê kir. Di encama şer de windahiyeke mezin a mirovî ya her du aliyan pêk hat, di heman demê de aboriya Ukranyayê a binav û deng, hilweşiya. Ev şer bandora xwe li tevahî welatên Ewropî jî kir. Lê piştî vegera Trump tê diyarkirin ku ew li rêyeke çareseriyê ji bo rawestandina şer digere.**R-4**

# Akademiya Şehîd Yadê Eqîde ji bo pêşxistina pîşeyên civakê ye

**Hemehengiya Meclisa Edaleta Jin beşê Akademî û Şopandinê Newroz Eseid diyar kir ku Akademiya Yadê Eqîde bi rêya perwerdeyan, hizir û pîşeyên civakê pêş dixe û got, "Armanca me ji perwerdeyên hizirî û pîşeyî ew e ku demên vala yên civakê ji holê rakin."**

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Şoreşa Rojava ya ku bi pêşengiya jinê pêk hat, di nava salên dûr û dirêj de gelek destkeftî qezenc kirin. Yek ji destkeftiyên jinan ku bi şoreşa li Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate bidestxistin; edalet e. Edaleta ku cewhera jinê ye û di nava pençên pergalê de asê mabû, di encama têkoşîna jinan a bi Şoreşa Rojava re li hemberî hemû zehmetiyan pêk hat. Di Konferansa Edaleta Jinê ya ku di sala 2016'an de hatibû lidarxistin, Meclisa Edaleta Jinê hatibû ragihandin. Jinan ji bo ku edalet, wekhevî û demokrasiyê di nava hukmên qanûnan de pêk were û rêxistinbûyîn belav bibe, biryareke bi vî rengî dan.

**Meclisa Edaleta Civakî ya Jinê ji 4 beşan pêk tê**

Meclisa Edaleta Jinê di 16'ê Mijdara 2018'an de 2'emîn Konferansa xwe ya li kantona Cizîrê li darxistibû. Ji bo berfirehkirina asta rêxistinbûna xebatên Meclisa Edaleta Jinê û hevkarî were misogerkirin. Herwiha xebateke hevgirtî were meşandin, di konferansa 2'emîn a ku di 16'ê Mijdara 2018'an de hatibû lidarxistin, Meclisa Edaleta Civakî ya Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê hate ragihandin. Meclisa Edaleta Civakî ya Jinê ji 4 beşan pêk tê û wiha ne: Mala Jinê, Dîwana Edaletê, Komîteya Lihevanînê û Akademî.

**Akademiya Meclisa Edaleta Civakî ya Jinê**

Di bin bana Meclisa Edaleta Civakî ya Jinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, Akademiya Edaleta Civakî ya Jinê ya Şehîd Yadê Aqîde di 13'ê Cotmeha 2020'an de li bajarê Amûdê li ser navê endama Meclisa Edaleta Civakî ya Jinê Yadê Aqîde ku di encama êrişên dagirkeriya dewleta Tirk ên li bajarê Serêkaniyê de şehîd bibû hate vekirin.

**Rêgezên bingehîn ên Meclisa Edaleta Civakî ya Jinê wiha ne:**

-Jin di nava Edaleta Civakî de bi awayekî xweser xwe bi rêxistin dikin.
-Di nava Edaleta Civakî de jin ji sedî 50 xwedî mafê nûnertiyê ye.
- Jin ji bo pêşxistina sîstema edaletê li gorî rêgezên exlaqî û siyasî yên civakê têdikoşin û dixebitin.
- Jinên ku di qadên Edaleta Civakî de dixebitin, pêşengiya avakirina civakeke exlaqî û polîtîk dikin û di pêşxistina wê de cihê xwe digirin.
- Jinên ku di nava sîstema Edaleta Civakî de dixebitin, divê azadiya jinê û jiyana hevpar a azad, jiyana civakî ya demokratîk, jiyana komînal a demokratîk hilbijêrin.
- Jinên ku di qada Edaleta Civakî dixebitin de, di hemû berpirsyarî, erkdarkirin û cezayan de vîn û nêrîna jinan bingehe.
- Jin di nava rêgez û nirxên civaka exlaqî-polîtîk de, di lêgerîn û têkoşîna heqîqetê de, têgînên kevneşop ên civakê û zîhniyeta dewletê red dikin.
- Parastina mafên jinan ên civakî û takekesî li ser hîmên xurt erkekî mirovî ye.
- Jin li dijî her cure tundî û bertekên civakî yên li ser jinan li hemberî sûcên eşirên malbatî yên di bin navê namûsê de, têdikoşin.
- Taybetmendiyên cewherî yên jinan wekî wekhevî, hevgirtin, parvekirin, edalet û hwd… faktorên Edaleta Jinê ye.
- Jin li dijî têgînên desthilatdarî, serdestî, xwedî dîtin, zayendîperestî, olperestî û neteweperestiyê têdikoşin û li dijî pergala desthilatdariyê ji bo pêşvebirina jiyanê rê û rêbazên guncaw bi pêş dixin.
- Jin xwe ji koletiyê diparêze û bawer dike ku parastin û berxwedan mafekî rewa ye.
- Jin li hember ferasetên ku zirarê dide statû û rûmeta wan mîna pere, dewlemendî û milk têdikoşin.
- Jin li hemberî nêzîkatiyên ku pirsgirêkên jinê weke pirsgirêkeke civakî nayê dîtin têdikoşe û nêzîkatiyên ku jinê biçûk dixîne weke sûcê li dijî mirovahiyê dibîne.
- Wek rêgeza bingehîn divê xebatkarên jin ên di warê Edaleta Civakî de dixebitin, bigihîjin asta hişmendiya demokratîk û bawernameyan ji Akademiyên Edaleta Civakî wergirin.
- Jinên ku di qada edaletê de dixebitin, hemû qanûn û peymanên navneteweyî yên ku statûya jin bilind dikin û cih dide pêşengiya wê ya di nava civakê de, dipejirînin û ji bo ku wan li gorî qanûnên herêmî bide rûnişkandin, dixebitin.






Derbarê avakirina Akademiya Yadê Eqîde û kar û xebatên wê, hemehengiya Meclisa Edaleta Jin beşê Akademî û Şopandin Newroz Eseid rojnameya me re axivî.
Newroz Eseid diyar kir ku vekirina akademiyan di nava Meclisa Edaleta Civakî ya Jinê de tecrûbeya yekemîne û wiha got: "Edaleta Jin di aliyê xweseriyê de şaxên xwe berfirehin. Beşên wê beşekî qanûnî ye. Komîta lihevanînê û mala jin jî pêve girêdayî ye. Li kêlek vê jî beşên akademî hatin vekirin, ev beşên akademî jî bi xweseriya jinê ve girêdayî ne. Vekirina akademiya jî tecrûbeyeke yekemîn bû ku me beşekî akademîk pêşeyî lê zêde kir. Pêwîstiya vê akademiyê jî ew e ku jin çawa bikare xwe birêxistin bike, heger xwendin tunebe çawa kar bike. Di heman demê de armanca me ya sereke jî ku em bêtir xwe nêzî civakê bikin, bi taybet jinên ciwan ku di ciwantiya xwe de nexweşiyên piskolojî bi wan re çêdibin. Herwiha dema vala ya jinan ji holê rakin. Ji ber dema mirov bixwaze dikare her tiştî bixwere bughere."

**'Akademiya şehîd Yadê Eqîde xizmeta civakê dike'**

Newroz Eseid anî ziman ku bi rêya perwerdeyan pêşeyiyên civakê pêş dixin û wiha got: "Akademiya bi navê şehîd Yadê Eqîde li bajarê Amûdê heye. Beşekî xwe fikirî û peşekî xwe pêşeyîye. Karê pêşeyî ew e ku çawa bikarin mamosteyan kom bikin, da ku perwerdeyên bêne xwestin civak çawa qebûl bike û serdana akademiyê bike. Bername û perwerdeyên akademiyê jî li ser bingeha pêşxistina jin û civakê ye. Di heman demê de xizmeta civakê ye. Perwerdeyên ku heta niha jî hatine dîtin evin: 4 perwerdeyên cildirûtinê derçûne, ew perwerde jî li ser meh û nîvekê dewam kirin. Di perwerdeyên fêrkirina cildirûtinê de 74 kes derçûn, ji wan 3 xort jî hebûn. Herwiha 3 perwerdeyên computer bi derçûna 26 kesan bi rengekî serkeftî pêk hatin. Li kêlek wê jî perwerdeyek ciwanker ku reng û xweşibûna jinê li gor xwestina civakê be, pêk hat, di vê perwerdeyê de 5 kes derçûn. Di dema niha de me prewerdeyên ragihandinê lê zêde kiriye û amadekarî jêre tê kirin. Armanca perwerdeya ragihandinê jî ew e ku kesên bixwazin fêrî girtina dîmen û çêkirina nûçeyan bibe, zanebûneke wan di milî de hebe. Ji ber di rastiya me ya niha de, her kêlî li bêşiya me bûyerk rû dide, lewra pêwîste her kes bi awayekî bilez û rast agahiyan belav bikin. Ji xwe perwerdeyên fêrkirina dirûtina hirî jî di nava xebatên me de heye."



**'Encamgiritina perwerdeyan bi rengekî serkeftî bû'**

Newroz Eseid axaftina xwe wiha qedand: "Di destpêkê erênekirin li cem kesên ku tevlî perwerdeyê bibin hebû. Lê piştî dîtin ku wê ev perwerde di aliyê jiyanî û aborî de bi wan re bibe alîkar, êdî xwestek li cem wan çê bû. Di heman demê de her kar dibe jêhatiyek, ew jêhatiyek jî dibe jibîrkirina êş û dûrxistina ji demên vala. Ji xwe mamosteyên ku van perwerdeyan jî didin bi dilxwazî ne. Ev perwerde ne rojane bû, di heftiyê de çend roj bûn. Perwerdeyên ku xwedekar û karker di nav de hebûn, me danê piştî nîvro wan perwerde dikir, hin jî di demên sibehê de bûn. Encamgiritina perwerdeyan jî bi rengekî serkeftî bû. Her perwerdak bi dawî dibe bawernameyên Akademiya Yadê Eqîde li wan tê belavkirin. Darayî van perwerdeyan jî bi rengekî sembolîke ku ew bikeve xizmeta peydakirina alavên pêwîst. Niha me alava tetrîsê jî aniye, tetrîs jî pêşeyîke kême, lê em dixwazin henekî pispor li ser kar bikin, ji ber pêşeyîya vê alavê li vir kêm bû, bêtirî xwe li Heleb û Şamê hebû, lewra em dixwazin ev yek li bajarê me pêş bikeve. Herwiha hewldanên me hene ku em beşê vê akademiyê li kantonan jî vekin û eyîn van perwerdeyan li wir bidin, mamosteyên me hene, lê cih hîn nehatine peydakirin."



# Ji çiraxên hunera kurdî

**Can Yûsif**

Muzîkjen Mihemed Ezîz Şakir Kaniya hunera kurdî ya ku diherike û zuha nabe Hunermend, bestekar û nivîskarê Kurd Mihemed Elî Şakir piştî karekî hunerî dewlemend ku bi gelek stran û awazan tijî bû, ji ber nexweşiya Koronayê koça dawî kir û ew çû oxirê û çavên wî ji bajarên Serêkaniyê dergûşa bîranînên wî yên ciwantiyê têr nebûn, çû oxirê hîn ew bi xeyala vegera bajarê xwe yê ku ji aliyê dagirkeran ve hatiye desteserkirin.

Koça dawî ya muzîkjen Mihemed Ezîz Şakir di 24.12.2020'an bû, bestekar û nivîskarê Kurd Mihemed Elî Şakire, ku di temenê 74 saliyê de ji ber tûşbûna bi vîrûsa Koronayê li nexweşxaneyeke bajarê Qamişlo ye jiyana xwe ji destda.



Hunermend, bestekar û nivîskar Mihemed Elî Şakir di sala 1946'an de li bajarê Dirbêsiyê ji dayîk û bavekî kurd ên ku rewşa wan ya jiyanî normal e, di nav malbateke olî ya olperest de hatiye dinê, xwendina xwe ya seretayî, amedeyî û lîseyê li bajarê Dirbêsiyê qedandiye. Ji salên destpêkê yên dibistana seretayî ve jêhatîbûna wî ya muzîkê hebû, li wir bi xwendina sirûdên olî û xwendina Qur'anê di dibistanê de dest bikarê hunerî kir û di demên helkeftan de beşdarî konserên dibistanê dibû û ew ji malbateke hunerî ya navdar e, Mihemed Elî Şakir di hevpeyvîneke xwe de wiha digot: (Ez bawer dikim ku jêhatîbûna stranbêjiyê ya ku di malbatê de heye mîratî ye, dengê bangdan kalê min ê ku li mizgefteke Dirbêsiyê bang dikir, hîn jî tê guhê min. Bavê min jî, di xortaniya xwe de, tembûrvan bû û dengê wî pir xweş bû)

Ew gelekî bi bandor bû bi muzîka erebî, bi taybetî hunermendên mezin wek (om Kultum, Mihemed Ebdulwehab, Ferîd Etreş, ji dibistana malbata Rehbanî û dengê Feyrûz) û di heman demê de, ew ji muzîka kurdî, muzîka dawetan û Radyoya Bexdayê "beşa kurdî" ne dûr bû, Ev dibistana wî ya bingehîn bû, ku jêhatiya wî ava kir, ewî ji folklora kurdî hez dikir û gelek bibandor bû bi stranên Mihemed Arif Cezrawî û awazên bestekarê soranî Şemal Saib, Fûad Ehmed û Celal Cemal)Ewî 12 salan mamostetî kiriye, piştre di sala 1975'an de bi keça kesayetekî netewî Yûsif Hersan re zewic ye û tevî malbat, bira û dê û bavê xwe li bajarê Serê Kaniyê bi cih dibe û çar zarokên wî hene, keçek (Şêrîn) û sê xortên (Şêrgo, Şiyar û Şêrwan) Li zanîngeha Helebê zimanê Îngilîzî xwend û di sala 1981'ê de xwendina xwe qedande.

Di sala 1968'an de dest bi nivîsandina helbestan û çêkirina stranên kiriye ji bo birayê xwe Mehmûd Ezîz Şakir, yê ku di cîhana hunerê de beriya wî despêkir bû, awaza wî ya yekem strana Zeynebê bû û piştre Gewrê û Ez keçim keça kurda me...hin din ) Nêzîkî 270 stranên wî hene ji nivîs û awazên wî û 30 stran ji helbestên helbestvanên din jî çêkirine wek (Cegerxwîn, Seydayê Tîrêj, Osman Sebrî, Yûsef Barazî... hin din ) ji wan 170 stran birayê wî yê hunermend Mehmûd Ezîz Şaker strandine, herwiha helbestên wî jî ji aliyê gelek hunermendên mezin ve hatine gotin, ji wan (Mihemed Şêxo, Mistefa Xalid, Zubêr Salih, Husên Salih û Şehrîbana Kurdî, Xoşnav Tilo û yên din).
Du dîwanên wî yên helbestan hene û li ser hemû mijar û babetên bi pirs û bûyerên kurdî re helbest nivîsandiye .Di jiyana xwe ya hunerî de gelek xelat û rêzgirtin wergirtine, di bîst û sêyemîn Festîvala Helbesta Kurdî de li Qamişlo di sala 2018'an de hat xelatkirin û xelata dan û afirandêriyê di sala 2019'an de ji aliyê destgeha ragihandina ARTA ve hat dayîn wergirtiye.

Sibeha roja pêncşema 24.12.2020'an hunermend û bestekar Mihemed Ezîz Şakir di temenê 74 saliya xwe de koça dawî kir, piştî şêst salên bexşandineke mezin, mîrateyek dewlemend a hunerî, wêjeyî û çandî ji bo wêje û çanda Kurdî li pey xwe hişt ku qirika gelek hunermendên mezin pê deng vedabûn, ji bilî Stran û helbestan wî gelek tabloyên hunerî yên ku folklor û mîrata kurdî vedibêjin nexişandine, lewra ew dê bimîne yek ji kesayetiyên hunerî li seranserê Kurdistanê, ji ber ku wî ji huner û muzîka kurdî re gelek awaz, stran û helbest pêşkêşkirine. Ew li bajarê Amûdê, li goristana Şermola, dûrî bajarê xwe Dirbêsiyê û bajarê wî Serêkaniyê ya dagirkirî, ku bi salan bi helbest û awazên xwe yên şîrîn bi bîr dianî, hate veşartin.

Bi koça dawî ya wî re Rojavayê Kurdistanê bi taybetî û Kurdistan bi giştî stûneke bilind ji huner û muzîka Kurdî ji dest da û valahiyek mezin di qada hunera Kurdî de hişt, lê mîrata wî ya muzîkê dê her û her di bîra hezkiriyên wî de bimîne û kaniya wî ya hunerî dê her biherike. Ji ruhê wî yê pak re, rûmet û sermedî û ji mîrateya wî ya hunerî, çandî û edebî re, hertimî û mayînde.

# 'Muzîk giyanê hunerê ye'

**Dilovan kêfo/ Amûdê**

**Hunermendê Kurd Edulbaqî Mihemed diyar kir ku wî bi israra xwe xewin û xeyalên xwe yên fêrbûna muzîkê pêk anî û wiha got: "Ez bi rêya muzîkê peyamê didim derdorê. Herwiha muzîk jiyana min xweş û geş dike."**

Hunermendê Kurd Ebdulbaqî Mihemed di sala 1968'an de li gundê Xerezê yê girêdayî bajarê Amûdê ji dayik bûye. Ebdulbaqî ji zarokatiya xwe ve ji muzîkê hez dikir. Dema ku ew zarok bû bi bavê xwe re li muzîkê guhdar dikir û bi karê muzîkê re mijol dibû. Wî her dem xeyal dikir ku dema ew mezin bibe, ew ê bibe hunermendekî binav û deng. Lewra li ser xewin û xeyalên xwe jiyan diafirand, heta ku ew xewin bûne rastiyek ji jiyan wî re. Ebdulbaqî bi navê xwe yê hunerî Mîrxan tê naskirin.
Derbarê hunera muzîkjenî û stranbêjiyê de, hunermendê kurd Ebdulbaqî Mihemed ji rojnameya me re axivî.
Ebdulbaqî Mihemed diyar kir ku ew dûrî muzîkê nikare bijî û wiha got: "Ez bêyî huner û muzîkê nikarim jiyan bikim. Çawa ku mirov nikare bêyî av û hewayê jiyan bikin, ez jî bêyî hunerê û muzîkê nikarim jiyan bikim. Min li ser destên xwe gelek saz çêkirin û gelek awzên min jî hene mîna 'Ey Helbeça Birîndar, Perî Zadê, Pîr û Kalinn, Bêrîvanê Ez Şivanim, Dest girtiya min'. Di 2011'an de ez weke hunermend hatima naskirin di nava civakê de, albûma min a yekem ji 8 stiran pêk dihat, herwiha min zêdeyî 100 awazî çêkirine. Çend strananên li ser bajarê Efrînê jî min çêkirine, 10 stran min tomar kirine. Mixabin hîn gelek stiranên min jî nehatine tomarkirin."
Ebdulbaqî Mihemed wiha domand: "Muzîk û karê hunerî mîna deryayê ye. Tu çiqsî ji ava aşqa muzîkê û hunerê vexwe tu têr nabe. Di rêwîtiya min ya hunerî de herî zêde min li gorî derfetên xwe kar dikir, ji ber ku di wê demê de tu kee tune bû ku min fêrî muzîkê û hunerê bike. Ji ber vê yekê min bi tena serê xwe, xwe fêr kir. Hunermendên ku ez ji wan hezdikim û ji wan bandor bûme Mihemed Şêxo, Seîd Yûsif, Seîd Gabarî, Tehsîn Taha û Aram Dîkran e. Zehemetiyên ku min didîtin kêmbûna cihên hunerî, tinebûna cihên qeydkirina stranan û nirxên wê yê buha. Bingeha xebatên min yên hunerî ji bo civakê ye. Ez hewil didim hunera kurdî bi tevahiya cîhanê bidim nîşandan. Tevahiya pirsgirêkên ku li pêş min derketin min ji xwe nekir astengî. Min meşa xwe ya hunerî bi hezkirin û biryardariyeke mezin dewam kir."

**'Li xewin û xeyalên xwe xwedî derkevin'**

Hunermendê Kurd Ebdulbaqî Mihemed bang tevahiya ciwanên kurd kir ku li hunera kurdî xwedî derkevin, ji ber ku bi riya muzîkê û hunerê mirov dikare nameyên xwe bide û axaftina xwe wiha qedand: "Ez bang ciwana dikim ku xewin û xeyalên xwe pêk bînin, herwiha li hunera kurdî xwedî derkevin. Bi xwebawerî û israrê mirov dighêje armanca xwe û tevahiya zehmetiyên jiyanê derbas dike. Herwiha hêviya jiyaneke aramî jiyan bikin."



# ‘Yên ku roja me tarî bikin, nikarin pêşeroja xwe bibîn in’

Welatparêzê kurd Nisredîn Xelîl yê ku gelek caran Rêber Apo dîtiye û li gel wî maye, anî ser ziman ku nêrandinên Rêber Apo jî bi serê xwe perwerde ye û wiha got “Rêber Apo bi ramanên xwe gel da fêmkirin ku Kurdistan heye û pêwîst e bê rizgarkirin.”

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Di serdema ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di navbera salên 1979-1998’an de li Sûriyeyê bû, gel ji bo bi Abdullah Ocalan re hevdîtinê pêk bîne serî li Şam û Lubnanê dida. Nisredîn Xelîl jî ji wan kesan e ku derfeta hevdîtina bi Abdullah Ocalan re peyda kiribû.
Derbarê naskirina xwe ya ji Rêberê Gelan Rêber Abdullah Ocalan re, welatparêz û bavê şoreşgerekî Nisredîn Xelîl ji rojnameya me re axivî.

**‘Dema cara yekemîn min Rêber Apo dît min teqez kir ku Kurdistan dê rizgar bibe’**

Welatparêzê kurd yê ji bajarê Kobanê Nisredîn Xelîl, di temenekî pir biçûk de Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan ditîye û hestên xwe wiha anî li ser ziman: “Ez li Kobanê di malbatekî ku ji aliyê aborî ve qels û feqîr bûn, ji dayik bûm. Dema destpêkê Rêber Apo derbasî aliyê bajarê Kobanê bû, temenê min 11 salî bû. Derbasî mala cîranê me bû, hevalên Cemal (Murat Karayilan) û Fuat (Elî Heyder Kaytan) bi gel Rêber Apo re li wê malê bûn. Ji ber min Rêbertî nasnedikir û temenê min hîn ciwan bû, min nedîzani ev Rêber Apo ye û ez ê rojekê jî wî bibînim. Navê xwe yê tevgerî binavê Elî Firat dihat naskirin û ev navê wî jî navdar bû. Hindirê hewşa cîranê



me de leytistoka fitbolê dileyistin û tîm ava dikirin pir bidisplîn dileyistin, ev bala me hemûyan pir kişand. Piştî dîtîna Rêber Apo ez pir bandor bûm, di sala 1984’an de bi lêkolîna ya ku derdorê min ya nêz ve min rêxistin naskir, em agahdar bûn ku PKK’ê hatiye damezirandin. Di wê demê de Tevgera Azadiyê bi navê “Telebe û Apocî” dihatin naskirin. Naskirina min ya tevgerê bi riya şehîdê nemir Xidir re çêbû û di sala 1985’an de ez tevlî rêxistina ciwanan bûm. Di sala 1986‘an de min biryar da ku em derbasî herêmên azad bibin. Di wê demê de Rêber Apo ferman derxisti bû ku yên temenê wan ciwan be, malbatê wan nerazî be nikarin derbasî çiyayên azad bibin. Malbata min ji ber wê demê ne welatparêz bû zêde erenî nêzî biryaramin ya tevlîbûna Tevgera Azadiyê nebûn. Ji ber hewildanên min yê tevlîbûnê di sala 1988’an de ez dîl ketim li destê rejîma Baas ya hilweşiyayî. Piştî derketina min ya girtîgehê Rêber Apo em xwestin ji bona perwerdê ya akademiya Mahsum Korkmaz ya leşkerî. Ji ber ku laşê min aliyê tenduristîde qels bû Rêber Apo ez li gel xwe hiştim û perwerde kirim. Me di her aliyê jiyanê de sûd ji Rêber Apo werdigirt. Li nêrandinek Rêbertî jî mera weke perwerde bû, ji ber ku watedar bû û mirov dida fikirandin. Hevalê Rêber Apo yê zaroktiyê şehîd Hemze (Hesen Bindal) yê ku bi riya komployekî veşartî hatiye şehîdxistin, rojekê me dît Rêber Apo jêre dibêje “Tu çima xwe naparêzî û bi hêsan xwe didin kuştin?” û me piştre fêm kir ku komekê hevalan bin fermendariya hevalê Hemze şandibûn çiyayê azad û rê de ketibûn dorpeça dijmin, binavê komê jîhevalê Hemze hişyar dikir. Dema ku em li gel Rêber Apo bûn, dewleta Tirk ya dagirker sixûrekê ku ne dihate naskirin şandi bû û bi salan ji di aliyê wan hatibû perwerde kirin. Rêbertî carekê rakir ser linga kesayetê wî dahurand û piştra herkesê zanî ku ev ji aliyê dijmin hatiye şandin. Rêber Apo di aliyê analîza mirovan da pir xurt bû. Rêber Apo pir giringî dida hevaltî û heval perwerdekirin ê. Bi seetan hevalan re mijûl dibû ev ezmûnê li gel xwe hemû didan ev hevalên li akademiyê de amade ne. Bi ramanên Rêber Apo û tevgera azadiyê kurd gehiştin lûtkeya serkeftinê. Me hertim hevalên ku li akademiyê pirs dikir min digot Rêber Apo pir bi dilnizmî nêz me dibe çima? Hevala digotin ji ber ku fikir û ramanên Rêber Apo mirovî ne, di heman demê de jî gerdûnî ne. Ev dibê sedem ku Rêbertî bide fêmkirin û bide meşandin. Rastiya dijminê me hîn berê de mera digot û dida zanîn ku ger ku em civakê perwerde nekin em ê têk biçin.”

**‘Ev berxwedanî û deskeftiyên niha me destxwistine keda Rêber Apo ya sala ne’**

Nisredîn anî li ser ziman ku civaka ku bi ramanên Rêber Apo xwe perwerde kiriye ji bona şerê gelê şoreşgerî amade dike, li berxwe dide û wiha domand: “Piştî perwerdeya Rêber Apo li Libnanê, min gelek qadên şoreşê de kar û xebat weke welatparêzekê dan meşandin. Piştî ku Rêber Apo dît ku em fêrbune û ezmûn girtine dîsa sala 1996’an banî me kir em derbasî li gel Rêber Apo bûn. Em perwerdekî 6 mehan de derbas bûn û ji ber ku ez ji Kobanê bûm wesazîyamin ji ba rêxistinkirina gelê Pirsûsa bajarê Riha hat çêkirin, lê min pir dixwest ez derbasî di nava gelê Botanê bibim. Rêber Apo ev pêşniyaramin ne pejirand û me nekarî em derbasî Pirsûsê jî bibin. Ji ber ku temenê min zarok bû malbatê ez Rêber Apo xwestim û ez hatim şandin ji bona malê. Lê ez ti carî dûr fikir û ramanên Rêber Apo û Tevgera azadiyê ne ketim. Piştî dîlgirtina Rêber Apo ya bi dirûşmeya “Hûn nikarin roja me tarî bikin” gelek mirovan cane xwe kirin pitê agirê. Min li Sûûdî Erebîstanê jî nûnertiya PYD’ê de weke rêveber salên dirêj cîh girt. Ez û zarokên min jî bi ramanên Rêber Apo hatin perwerdekirin. Ji bona zarokên xwe care paraznamayên Rêber Apo dixwunim û kurê min yê binavê Rênas Kobanê jî tevlî tevgera azadiyê bûye. Gelê Rojavayê Kurdistanê yên ku ramanên Rêber Apo xwere kiriye mertal jî li Bendava Şehîdan kirine bendava azadiyê.”

**‘Em pir bi hêvî ne ku ev pêvajoya Rêber Apo jê rê pêşengî kirye, wê serbikeve’**

Xelîl da diyarkirin ku hevdîtinên demên dawiyê yên li gel Rêber Apo tên meşandin, hêviyek mezin daye avakirin û wiha axaftina xwe qedand: “Ev pêvajo hem ji bona gelê Kurd û hem jê ji bona civaka herêmê giştî jî gavekî pir bi erenî ye. Ji ber ku ev salane her du aliyan jî pir êş kişandin. Ev dem jî dema çareserî û aşitiyê ye. Lê di heman demê de ger tecrîd û êrîşên dagirkeriyê neyên sekinandin, ti kes nikare qala pêvajoyekê aşitî û çareserîyê bik e. Pêwîste tecrîda li ser Rêberê gelan bê rakirin û pêşîya wî bê vekirin. Em di wê hêvîyê dane ku em Rêber Apo di nav xwe de bibînin û hemû ked û hewildanên me jî li ser azadkirina fizîkî ya Rêber Abdullah Ocalan e. Weke gel û civak ti pêvajoya ku Rêber Apo pêşengtiye dike em jî amadene ku li kêleka Rêber Apo û Tevgera Azadiyê cih bigirin erkê ku dikeve li ser milê me pêkbînin.”

# Pirsgirêka avê li bajarê Hesekê didome

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Piştî dagirkirinan Serê Kaniyê ji aliyê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ve, ava stasyona Elok ku dikeve gundewarê bajarê Serê Kaniyê li ser welatiyên bajarê hesekê hat qutkirin. Ji wê demê ve û heta niha welatiyên bajarê Hesekê pirsgirêka peydakirina avê jiyan dikin.**

Dewleta Tirk a dagirker dema ku di sala 2019’an bajarê Serê Kaniyê dagir kir ava stasyona Elok li ser bajarê Hesekê qut kir. Ev jî bû sedem ku milyonek mirov ji avê bê par bin.
Li gel şerê ku li herêmê diqewime, aloziya avê zêdetir dibe ji ber nebarîna baranê di werzê çile de û guhertina avhewaya herêmê.
Zêdetirî milyon kesî li bajarê Hesekê li ser stasyona Elok jiyan dikin, niha xwe dispêrin tankerên avê ku ji cihên dûrî herêmê tên bajar.
Di çarçoveya şerê çekdarî û operasyonên leşkerî yên berdewam li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê, binesaziya herêmê û avahiyên sivîl bi awayekî rasterast tên hedefgirtin, di van hedefgirtinan de cihên avê, enerjî û neftê pêwistiyên rojane yên gelên herêmê têne armanckirin. Li gorî raporên rêxistinên hiqûqî û mirovî, di nav de (Human Rights Watch) di Sibata 2024`an de ev kiryarên dijî mirovahiyê bandoreke mezin li ser jiyana şêniyan kiriye. Aloziya avê zêdetir dibe ji ber koçberiya ku çêdibe bi sedema êrişên dagirkeriya Tirk û çeteyên girêdayî wê li ser herêmên cuda.
Hejmara şêniyên Hesekê ji sala 2019`an milyonek derbas kir. Ji ber êrişên dewleta Tirk, bi taybet di vê dema dawiyê de, piştî hilwişandina rêjîma Esad û destserkirina hin herêmên din mîna Şehba û gundewarên wê ku piraniya wan koçberên Efrînê lê bi cih dibûn bi sedema êrişên çeteyên dagirkeriya Tirk, ev şênî dîsa bi darê zorê koçber bûn û hatin herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybet li bajarê Hesekê ji ber



vê yekê hejmar dibe ku zêdetir bûye, bi vî awayî aloziya avê her ku diçe xirabtir dibe.
Stasyona Elok ku ji sala 2019`an ve hatiye rawestandin, çavkaniya sereke ya niştecih û koçberên bajarê Hesekê, gundewar û kampan e. Pirsgirêka avê bandoreke mezin li ser tevahiya qadên jiyanê dike, ev yek dibe sedema bandorên neyînî li ser niştecih û koçberan, di nav de aliyên aborî ya têkildarî avê, bi taybet qada çandiniyê û xwedîkirina sewalan, ku ew çavkaniya sereke ya şêniyên herêmê ye, wekî din qirêjiya çavkaniyên xwezayî ku binesaziya herêmê xirab dike.
Di çarçoveya pirsgirêkên cuda, çareseriyên awarte derketin weke eltrnatîf ji bo peydakirina pêwstiyên rojane ji avê, ev çareserî di veguhestina avê de bi tankan (giştî û taybet), ji çavkaniyên cuda weke kaniyên herêmî, her wiha avakirina projeyên avê ji çend çavkaniyên curbicur.

**Alternatîfên**

Bîrên Nefaşa û Şemoka, hin ji van bîran girêdayî gerenîndeya avê ye û hin bîrên taybet ên şêniyan hene di xizmeta gel de ne. Bi destûr ji aliyê şaredarî û Gerenîndeya Avê hetin kolandin. Projeya Nefaşa dikeve bakurê çiyayê Kewkeb, 47 gund sûd jê digrin. Di demeke nêz de wê ev proje bên berfireh kirin û bîrên ne di xizmetê de wê aktîv bikin.
Çavkaniya din projeya Firatê, bi awayekî domdar av tê sekinadin. Ji sedî 35 pêwistiyên bajarê Hesekê ji avê tên peydakirin.
Rewşa avê li Hesekê pir xirab e nemaze kêmbûna baranê jî wê bi awayekî mezin banodrê li ser kêmbûna avê bike.
Hêjayî zanînê ye ku ji dîroka 2023-10-15 heya roja îro ava stasyona Elok hatiye qutkirin.



# PKK: Ji îro pê ve em agirbestê îlan dikin!

Komîteya Rêveber a PKK’ê ragihand ku ji bo Banga Rêber Apo ya Aşitî û Civaka Demokratîk pêk were, ew ji îro pê ve agirbestê îlan dikin; “Pêkhatina mijarên weke çekdanînê jî bes bi pêşengtiya pratîk a Rêber Apo pêkan e.”

**Navenda Nûçeyan**

Naveroka daxuyaniya Komîteya Rêveber a PKK’ê ya têkildarî banga Rêber Apo ya bi sernavê ‘‘Ji Gelê Me Yê Welatparêz û Raya Giştî Re” bi vî rengî ye:
Daxuyaniya Rêber Abdullah Ocalan ya 27’ê Sibatê ya bi sernavê “Banga Aşitî û Civaka Demokratîk”’, rêya hemû hêzên azadî û demokrasiyê ronî dike û weke Manîfestoya Serdemê ye. Ji bo ku li gelê me û mirovahiyê manîfestoya civaka demokratîk zêde kiriye, em bi rêzdarî Rêber Apo silav dikin.

**‘Pêkanîna naveroka wê ya bi awayekî serkeftî jî gelekî girîng e’**

Li gel Banga berbehs diyar e ku li Kurdistan û Rojhilata Navîn pêvajoyeke dîrokî dest pê kiriye. Ev yek dê bandoreke mezin li pêşketina rêveberiya demokratîk û jiyana azad a li seranserê cîhanê bike. Girêdayî vê yekê berpirsiyarî dikeve berê me hemûyan; divê her kes li erk û berpirsiyariyên xwe xwedî derkeve û wan bi cih bîne. Bêguman kirina bangeke bi vî rengî gelekî girîng bû; a niha pêkanîna naveroka wê ya bi awayekî serkeftî jî gelekî girîng e. Em weke PKK’ê bi awayekî rasterast tevlî naveroka Banga berbehs dibin û diyar dikin ku em ê li gorî pêwîstiyên Bangê tev bigerin û wan bi cih bînin. Lê belê ji bo serkeftinê jî divê şert û mercên siyaseta demokratîk û zemîna hiqûqî jî werin dabînkirin.

**‘Hêza rêvebirina têkoşînê û daneheva pkk’ê ya hatiye avakirin dide gel’**

Pir eşkere ye ku PKK, bû tevgera heqîqet û lehengiyên mezin ên nîvsedsala dawîn a Kurdistanê. Her tişt bi têkoşîneke mezin a lehengî, fedekarî, berdêl û keden mezin hatin bidestxistin. Em hemû şehîdên leheng ên vê têkoşîna azadiyê bi rêz, hezkirin û minetdariyeke mezin bi bîr tînin. A niha em bi heman ruh û baweriyê destkeftiyên dîrokî yên berbehs derbasî pêvajoyeke nû ya têkoşînê dibin. Hişmendiya ku Rêber Apo pêşkêş kiriye û tecrûbeya mezin a PKK’ê afirandî, başî, rastî, bedewî û hêza rêvebirina têkoşîna azadiyê ya bi rêya siyaseta demokratîk dide gelê me.

**‘Bi qasî ku êrîş çênebin dê tu hêzên me çalakiyên çekdarî li dar nexin’**

Di vê çarçoveyê de, ji bo ku Banga Rêber Apo ya Aşitî û Civaka Demokratîk pêk were, em ji îro pê ve agirbestê îlan dikin. Bi qasî ku li hemberî me êrîş çênebin, dê ti hêzên me çalakiyên çekdarî li dar nexin. Her wiha pêkhatina mijarên weke çekdanînê jî bes bi pêşengtiya pratîk a Rêber Apo pêkan e.

**‘Ji bo serkeftina kongreyê divê rêber apo bi xwe bi rê ve bibe’**

Her wiha em amade ne ku li gorî daxwaza Rêber Apo kongreya partiyê li dar bixin. Lê belê ji bo pêkhatina vê divê şert û mercên guncav werin dabînkirin û ji bo serkeftina kongreyê jî divê Rêber Apo bi xwe ji kongreyê re pêşengtiyê bike û bi rê ve bibe. Heta niha li gel hemû xeta û kêmasiyan me rêveberiya şerî kir; lê belê bes Rêber Apo dikare rêveberiya Serdema Aşitî û Civaka Demokratîk bike.

**‘Divê şert û mercên azadiya fîzîkî, jiyan û xebitîna azad werin dabînkirin’**

Rastiyên şênber pir eşkere nîşan didin ku ji bo Banga Aştî û Civaka Demokratîk bi awayekî serketî pêk were, ji bo demokratîkbûna Tirkiye û Rojhilata Navîn a li ser esasê çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd, ji bo pêşxistina tevgera demokrasiya kurevî, divê şertên Rêber Abdullah Ocalan ên ku karibe bi awayeke fizîkî azad bijî û bixebite bên mîsogerkirin, hevalên wî jî di nav de karibe bê astengî bi kesên ku dixwaze re têkiliyê çêbike. Em hêvî dikin ku pêwîstiyên vê yekê ji aliyê saziyên pêwendîdar ên dewletê ve bên bicihanîn.

**‘Bang ne ya dawî ye destpêkek nû ye’**

Gel û dostên me yên hêja!
Banga Rêber Apo teqez ne ya dawî ye, berevajî vê destpêkek nû ye. Weke ku di daxuyaniyê de pir balkêş tê gotin û bi awayekî eşkere radixe berçavan ku tiştên ku divê di 35 salên dawî de û bi taybetî di van 20 salên dawî de bihatana kirin, lê bi qasî tê xwestin di dema xwe de nehatin kirin, niha divê teqez bên kirin. Di vî warî de pêwîst e Banga Rêbertiyê, sedemên wê, taybetmendî û erkên




pêvajoya nû ya ku daye destpêkirin rast û têr bê fêmkirin û divê pêwîstiyên wê serketî pêk bînin. Divê bi berpirsyarî û cidiyeteke mezin nêzî naveroka bangê bibin û gelekî girînge ku li her qadê bi awayekî serketî were bicihanîn.

**‘Divê em hemû ji bo serketina banga rêbertiyê xwe berpirsyar bibînin’**

Em ji bîr nekin ku barê herî mezin Rêber Apo her tim hilgirtiye ser milê xwe, rêya me ronî dike û pêşengiya me dike. Niha bi ‘Banga Aştî û Civaka Demokratîk’ gaveke nû davêje û ji bo hemû bindestan bi taybetî jin û ciwanan pêvajoyeke nû ya têkoşînê dide destpêkirin. Ji ber vê yekê em taybetmendiyên vê pêvajoya nû rast fêm bikin û li ser esasê ku her tim li hemberî her cure sextekarî û êrîşan amade bin, erkên wê bi serketî bi cih bînin. Em rêxistinbûna xwe ya demokratîk û têkoşîna xwe ya azadiyê li her qadê bi cesaret û fedakariyeke mezin li Kurdistan, Rojhilata Navîn û li çar aliyê cîhanê geş bikin. Divê em hemû ji bo serketina Banga Rêbertiyê xwe berpirsyar bibînin.

**‘Banga xurtir xwedî li 8’ê Adarê û Newrozê derkevin’**

Va ye, em ketin meha Adareke nû û kelecana 8’ê Adarê û Newrozê dijîn. Em Şoreşa Azadiya Jinê li ser bingeha Jineolojiyê pêş dixin û li ser xeta Şaristaniya Demokratîk jiyana civaka exlaqî û polîtîk bi rêxistin dikin. Em hewl didin heqîqeta Apoyî bi awayekî rast û têr fêm bikin û şoreşa heqîqetê ku şoreşa zihniyet û şêwazê jiyanê ye pêş bixin. Banga Rêber Apo ya dawî di eslê xwe de banga xurtir xwedî li 8’ê Adarê û Newrozê derkevin û bi kelecaneke mezin pîroz bikine. Ji her kesî zêdetir divê jin û ciwan vê Bangê rast fêm bikin, bi xurtî xwedî lê derkevin û pêdiviyên wê bi cih bînin.
Li ser van esasan em 8’ê Adarê Roja Jinên Kedkar û Newrozê li hemû jin û ciwanan, gelê xwe û dostên xwe pîroz dikin û bang li her kesî dikin ku bi ruhê 8’ê Adarê û Newrozê xwedî li banga Rêbertiyê derkevin û li her qadê têkoşîna azadiyê geş bikin!
Bijî Pêşengê Qehreman ê Gelê me PKK!
“Bijî Rêber APO !”

# Banga Aştî û Civaka Demokratîk

**Rêber Abdullah Ocalan**

PKK; di sedsala 20’an de, di sedsala herî tund a dîrokê de ava bû. Zemîna ku PKK tê de hat afirandin zemîna du şerên cîhanê, reel-sosyalîzm (sosyalîzma pêkhatî) û dema şerê sar ê li cîhanê bû. Di vê zemînê de înkarkirina rastiya Kurdan, qedexekirina azadiyan, bi taybetî jî qedexekirina azadiya ramanê li dar bû.
Di warê teorî, bername, stratejî û taktîkan de bandora rastiya pergala reel-sosyalîst a sedsalê li ser vê avabûnê çêbûye. Di salên 1990’an de, ji ber sedemên navxweyî hilweşîna reel-sosyalîzmê, şikestina înkara nasnameyê li welat û pêşketinên azadiya ramanê bû sedem ku PKK wateya xwe biborîne û xwe zêde dubare bike. Ji ber vê yekê ew jî wekî yên din hatiye dawiya jiyana xwe û pêwîstî bi fesihkirina wê heye.
Têkiliyên Kurd û Tirkan; di dîroka zêdetirî hezar salan de Tirkan û Kurdan ji bo hebûna xwe bidomînin û li dijî hêzên hegemonîk li ser piyan bimînin, her tim pêwîstî pê dîtine ku bi dildarî di nava tifaqekê de bimînin.
Dused salên dawî yên modernîteya kapîtalîst, şikandina vê tifaqê ji xwe re kiriye armanc. Hêzên ku bandor li wan bûye, ligel bingehên xwe yên çînî, xizmeta vê yekê esas girtine. Ev pêvajo bi şîroveyên yekreng ên Komarê leztir bûye. Erka sereke ew e ku têkiliya dîrokî ya îro şikestiye, bi ruhê biratiyê û yekîtiyê, li gel ku em baweriyan jî paşguh nekin, ji nû ve birêxistin bikin.
Pêwîstiya civaka demokratîk jêneveger e. PKK, di dîroka Komarê de tevgera serhildan û şîdetê ya herî dirêj û berfireh e. Ji ber ku rêya siyaseta demokratîk girtî bû, PKK bi hêz bû û destek stend.
Netew-dewletên cuda, federasyon, xweseriya îdarî û çareseriyên kulturalîst ku encama pêwîst a neteweperestiya tund in, nikarin ji sosyolojiya civaka dîrokî re bibin bersiv.
Rêzgirtina nasnameyan, azadiya ramanê, rêxistinbûna demokratîk, avakirina civakî-aborî û siyasî ya hemû pêkhateyan, tenê bi hebûna civak û qada siyasî ya demokratîk mumkin e.
Sedsala duyemîn a Komarê tenê dema ku bi demokrasiyê were tacîdarkirin dikare bibe xwedî yekîtî û berdewamiyek mayînde. Ji demokrasiyê pê ve tu rêyeke lêgerîna pergalan û pêkanîna wan tuneye û ne mimkin e. Lihevkirina demokratîk rêbaza bingehîn e. Divê zimanê serdema aştî û civaka demokratîk jî li gorî vê rastiyê bê pêşxistin.
Banga ku Birêz Devlet Bahçelî kir, îradeya ku Birêz Serokkomar nîşan da û nêzîkatiyên erênî yên partiyên din ev pêvajo ava kir û ez jî di vê pêvajoyê de banga çekdanînê dikim û ez berpirsyariya dîrokî ya vê bangê hildigirim ser xwe.

Çawa ku her civak û partiya hemdem ku hebûna wê bi darê zorê nehatiye bidawîkirin, hûn jî bi dildarî Kongreya xwe bicivînin û biryaran bistînin; divê hemû kom çekên xwe deynin û PKK xwe fesih bike. Ez silavên xwe ji hemû kesan re dişînim ku baweriya jiyana hevpar dikin û guh didin banga min.”

# Trump hewldana rawestandina şerê Rûsya û Ukraniya dike!?

Di 24'ê Sibata 2022'an de Rûsya dest bi êrişên ser Ukranyayê kir. Di encama şer de windahiyeke mezin a mirovî ya her du aliyan pêk hat, di heman demê de aboriya Ukranyayê a binav û deng, hilweşiya. Ev şer bandora xwe li tevahî welatên Ewropî jî kir. Lê piştî vegera Trump tê diyarkirin ku ew li rêyeke çareseriyê ji bo rawestandina şer digere.

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Piştî hewldanên Ukraniyayê ji bo tevlîbûna nava NATO û Yekîtiya Ewropayê, Rûsya ev yek weke metirsî li ser welatê xwe dît. Ji ber ku sînorekî dirêj di navbera wê û Ukranyayê de ye. Tevlîbûna Ukraniyayê ji NATO'yê re tê wateya ku çekên giran NATO'yê li ser erdê Ukranyayê bê bicihkirin. Ji ber vê yekê Rûsyayê çendî caran wekî gef li Ukranyayê xwarin û got; Heger tû van gavan bavêje, ez ê xaka te dagir bikim. Lê piştî Volodymyr Zelensky ev gav dewam kirin Ukraniya zêdetir nêzîkî NATO û Ewropayê bû û hewldanên cidî kirin ku tevlî Yekîtiya Ewropayê (YE) û NATO bibe. Lewra di 24'ê Sibata 2022'an de Rûsya dest bi dagirkirina xaka Ukranyayê kir.

### Di şerê Rûsya û Ukranyayê de windahiyeke mezin a mirovî pêk hat

Mîsyona Çavdêriya Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî li Ukraynayê (UNHCR) ji destpêka şerê Rûsyayê ve diyar kir ku heta niha zêdetirî 11 hezar û 743 sivîl jiyana xwe ji dest dane û 24 hezar û 614 kes jî birîndar bûne. Dibe ku hejmara rast a windahiyan ji vê zêdetir bin. Herwiha dozgerên Ukraynayê diyar kiribûn ku heta 14'ê Mijdara 2024'an 589 zarokên Ukraynayî hatine kuştin. Sivîl ji tirsa şer gelek êş kişandin, lê piraniya kesên hatin kuştin leşker bûn. Ev şerê ku di navbera du hêzên nûjen de pêk hatî, encameke mezin a winahiya herdû hêzan çê bûn. Bi taybetî di xetên pêş ên vî şerî de bi hezaran mirov bûn qurbanî.
Herdu alî baldar in ku tomara qurbaniyên xwe yên leşkerî li gorî ewlekariya netewî eşekere bikin. Lewra texmînên giştî yên welatên Rojava li ser bingeha raporên ku istixbaratî pêşkêşî dikin. Lê piraniya texmînan ew e ku bi sed hezaran birîndar û kuştinî ji herdu aliyan heye.
Serokê Ukranya Volodîmîr Zîlînskî di referanseke Sibata 2024'an de diyar kiribû ku 31,000 leşkerên Ukraynayê hatine kuştin. Lê derbarê hejmara birîndar û windayan de tû amarek nedabû. Ev şer rêjeyên mirinê, bi sedemên cûda li seranserê Ukraynayê zêde kir. Herwiha bû sedema ku rêjeya jidayikbûnê bi qasî sêyek hilweşe. Di heman demê de zêdetirî 6 mîlyon Ukraynî neçar kir ku birevin Ewropayê û nêzîkê 4 mîlyon mirov di hundur de koçber kir. Neteweyên Yekbûyî diyar kiribû ku nifûsa Ukraynayê ji destpêka dagirkirinê ve bi qasî 10 mîlyon kesî an jî çaryekek kêm bûye.

### Şer aboriya Ukranyayê hilweşand

Aboriya Ukraynayê di sala 2022'an de bi qasî sêyek kêm bû. Tevî mezinbûna aboriyê di sala 2023'an de, lê hîn jî ji sedî 78 mezinahiya xwe ya beriya dagirkeriyê ye. Lê li gorî nirxandina Banka Cîhanî, Komîsyona Ewropî, Neteweyên Yekbûyî û hukûmeta Ukraynayê ve destnîşan kiribûn ku zirara rasterast ji şerê li Ukraynayê heya Kanûna 2023'an de gihîştiye 152 mîlyar dolarî. Ev zirar herî zêde xanî, veguhastin, bazirganî, pîşesazî, enerjî û çandiniyê dîtin. Hikûmeta Ukraynayê û Banka Cîhanî diyar kiribûn ku lêçûna giştî ya nûavakirin û vejandinê li gorî dawiya Kanûna sala borî 486 milyar dolar bû. Li gorî daneyên Wezareta Aboriyê ev jimar 2,8 qat ji GDP-ya binavkirî ya Ukraynayê di sala 2023'an de zêdetir e. Rûsya di êrişên xwe yên birêkpêk de binesaziya Ukranyayê dike armanc, di van êrişan de sektora enerjiyê ya Ukraynayê bi taybetî zirar dîtiye.
Ukranya çavkaniyek sereke ya genim e li cîhanê, lewra pêkanîna şer li Ukranyayê krîza xwarinê ya cîhanî girantir kiriye. Ukrayna piraniya dahata dewleta xwe ji bo berevaniyê xerc dike û xwe dispêre alîkariya darayîya hevkarên xwe yên Rojavayî. Seroka komîteya sermîyan a parlementoyê Roksolana Bîdlasa diyar kiribû ku her roj şer û pevçûn li Kîevê bi qasî 140 mîlyon dolar tê xerckirin. Herwiha di pênyara budceya 2025'an de ku parastin dê ji sedî 26 GDPya Ukraynayê, ango 2.2 trîlyon hrîvniya (53.3 mîlyar dolar) bixwe. Ukranya beriya niha ji hevkarên xwe yên Rojavayî zêdetirî 100 milyar dolar alîkarîya aborî wergirtibû.

### Şerê li Ukraynayê ev zêdetirî 3 sal in berdewam dike

Nûnerê Bilind ê Karûbarên Derve yê Yekîtiya Ewropayê Josep Borrell di civîneke çapemeniyê li Kîevê eşkere kiribû ku ew pakêta 15'emîn a cezayên li dijî Rûsyayê amade dikin.
Cebilxaneyên leşkerî yên welatên Ewropî ji ber şerê li Ukraynayê rastî valahiyeke dijwar tê. Piştî serkeftina Donald Trump li Dewletên Yekbûyî, gelek kes li parzemînê meraq dikin gelo dê pola Komarî piştgirîya xwe ya leşkerî ji Ukraynayê re bidomîne û banga xurtkirina şiyanên berevaniyê yên Ewropî bike.

### Ewropa li ber ketina felakete aborî ya cîhanî ye

Gelek hişyarî li ser metirsiya aborî ya li pêşiya Ewropayê hene. Yekîtiya Ewropî ji ber cezayên ku li ser Rûsyayê sepandin e, li ber ketina felaketek aborî ya cîhanî ye. Herwiha piraniya welatên Rojavayî jî li ber ceribandina encamên şerê di navbera Rûsya û Ukrayna de ne. Welatên Ewropî bi kûrahî ketine nav pevçûnek ku ne ji bo çareserkirina wê, lê ji bo domandina wê hewl didin.

### Krîza enerjiyê

Enerjî yek ji bandorên herî mezin e ku bandorê li Ewropayê dike. Ji ber şerê Ukraynayê bihayê gazê li Ewropayê gihîştiye asta herî bilind di heyama salekê de ku ji 500 dolarî bo her hezar metrekup derbas bûye.

### Vegera Trump û siyaseta wî ji bo çareserkirina şerê di navbera Rûsya û Ukranyayê de

Trump siyaseta Amerîka li ser Ukrayna serûpel dike. Serokê Amerîka rêkeftina xwe bi Pûtîn re ragihand ji bo destpêkirina danûstandinan ji bo bidawîkirina şer. Ragihandina Serokê Amerîka Donald Trump li ser rêkeftina wî ligel Serokê Rûsyayê ji bo bidawîkirina şer û destpêkirina aştiyê bû sedema bertekên berfireh. Trump siyaseta sê salan a Amerîkî li hember



Ukraynayê berevajî kir, piştî ku wî got ku wî bi serokê Rûsyayê re li hev kir ku dest bi danûstandinan bike ji bo bidawîkirina şer. Trump diyar kiribû ku wî zêdetirî saetekê bi Pûtîn re bi rêya telîfonê axivî ye û dabû zanîn ku ew li ser rêya aştiyê ne. Herwiha paşê Trump bi Serokê Ukraynayê Volodîmîr Zîlînskî re axifî. Lê ti pabendî li ser wê yekê neda ku Ukrayna di danûstandinên DY bi Rûsyayê re bibe hevkarek wekhev. Trump bi axaftina xwe ya bi serokkomarê Rûsyayê re banga rawestandina şer û çareseriyeke aştiyane kir. Herwiha serokomarê Rûsyayê Pûtîn jî di serî de bal kişand ser ji holê rakirina sedemên bingehîn ên şer û bi Trump re li hev kir ku bi hevdîtinên aştiyê, çareseriyeke demdirêj pêk were. Axaftina Trump bi Pûtîn re dibe ku nîşaneyeke dramatîk şandibe ku Waşonton (Washington) û Mosko dê bixebitin ku bigihîjin rêkeftinekê ji bo bidawîkirina şer li Ukrayna bi kombûna li dora hukûmeta Kievê.
Tevî ku destwerdanên Amerîka alîkariya du şerên cîhanî yên ku li Ewropayê dest pê kirin û paşê azadiya parzemînê li dijî Sovyetê garantî kir. Lê Trump di dema kampanyaya xwe ya hilbijartinê de anîbû ziman ku dibe ew welatên NATO'yê neparêze ger ew têra xwe veberhênanê di berevaniyê de nekin.

### Washington red dike ku Moskowê şermezar bike

Di guhertineke kalîteyî de, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê di 20'ê Sibata 2025'an de dengdana xwe ji bo projeya Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ya şermezarkirina kiryarên Rûsyayê red kir. Herwiha pabendîbûna xwe bi serwerî, serxwebûn û aramiya xaka xwe di sînorê Ukranyayê de piştrast kir. Helwesta nû ya Dewletên Yekbûyî guherînek mezin ji aliyê yek ji piştgirên herî mezin ên Keyiv ve nîşan dide piştî sê salan ji piştgirîya leşkerî, di dema ku Washington hema hema bi gelemperî biryarên Neteweyên Yekbûyî yên piştgirîkirina Ukraynayê li dijî Rûsyayê pejirand. Trump di wê baweriyê de ye ku tevlîbûna Amerîka di şer de xizmeta berjewendiyên Amerîka nake. Di guherînek bingehîn de ji siyaseta derve ya berê ya Dewletên Yekbûyî, Trump hilbijart ku rasterast bi Rûsyayê re danûstandinan bike, da ku bilez şer û pevçûnên Rûsya û Ukranyayê bidawî bike. Daxuyaniyên Amerîkayê yên li hember Moskovayê erênî bûn û ji bo amadekariya hevdîtina her du serokan a li Riyadê jî di navbera her du wezîrên derve de civînek hat lidarxistin, ji bo rêvekirina civandina her du serokan. Di 12'ê Sibata 2025'an de Serokê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn bi rêya telîfonê bi serokê Amerîkî Donald Trump re axivî. Berdevkê bi navê Kermelîn Dmitry Peskov da zanîn ku di axaftinên herdû serokan de gelek mijar hatin nîqaşkirin, di nav de hevsengiya pevçûna Ukranya û rewşa Rojhilata Navîn. Li gorî rojnameya Brîtanî "The Guardian", Trump roja Pêncşemê "xemgîniya" xwe ji şîroveyên Zelensky nîşan da ya ku tê de dûrxistina wî ji danûstendinên di navbera Amerîka û Rûsyayê de ji bo bidawîkrina şerê li Ukranyayê rexne kiribû. Di tevgerek nakok de, xuya bû ku Trump Ukrayna ji şer berpirsiyar dibîne. Trump destnîşan kiribû ku Kîev karîbû lihevkirinek çêbike ji bo rawestandina şer.
Wezîrê Derve yê Amerîka Marco Rubio di 18'ê Sibata 2025'an de piştî hevdîtina bi Wezîrê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov re li Riyadê, ragihand ku li ser pêngavên destpêkê yên destpêkirina danûstandinan ku tîmên ji her du aliyan hatine avakirin, lihevkirinek pêk hatiye.
Li gorî hemû daneyan, Ukrayna bi fikar e derbarê domandina danûstendinên ku di navbera Rûsyay û Amerîka de beyî beşdariya rasterast a Kîevê.

### Ukranyayê naxwaze Amerîka dest ji piştgirîya wê berde

Dewletên Yekbûyî ji bo şerê Ukraynayê di Sibata 2025'an de bi deh mîlyar dolar alîkariya leşkerî pêşkêşî Ukraynayê kiriye. Rêveberiya Trump hewl dide ku hevpeymanekê bi Ukranyayê re çê bike dê di berdêla alîkariya Washingtonê de 500 milyar dolar tawîzên madenê bide Dewletên Yekbûyî.
Serokê Ukraynayê Volodymyr Zelensky di 19'ê Sibata 2025'an de got ku pêşnîyara Amerîka ya li ser metalên nadir li wî welatî bê garantîyên ewlehîyê ye û dê li hember Kîevê ne adil be. Herwiha di serdana xwe ya Enqereyê de di daxuyaniya xwe ya çapemeniyê de, li ser pêşniyara Amerîkayê diyar kir ku eger em tiştekî bidin, divê di berdêla wê de tiştekî bi dest bixin. Welatê wî jî naxwaze bibe navendek a madeyên xam ji bo tu parzemînan û ew ne li ser dostanî û hevkarîyê ye, lê wî tekez kir ku ew naxwaze Amerîka dest ji piştgirîya wî berde û dixwaze Donald Trump bêtir li gel Ukraynayê bisekine.



## Abdullah Ocalan şensê aşitiyê dide!

**Mihemed Seydî**

Pirsgirêka Kurd û hebûna wê careke din bi peyama Rêber Apo Re ket rojeva hemû Cîhanê. Di vê derbarê de her kes nîqaşê li ser peyama ji Îmralî hatî dike, bandora wê li ser hemû herêmê tîne ziman û wê çi biqewime û rewş çawa bibe şirove dike. Lê hinek xalên girîng ku mirov dikare pê dakeve hene û ew jî wiha ne: Çekdanîna PKK'ê û bandora wê li ser nasnameya Kurdan û hebûna Kurd bêyîn çek û dîsa garantiya ku wê qirkirina Kurd pêk neyê çawa û kî bide. Di peyama Abdullah Ocalan de hat gotin ku pêvajo guheriye û serdemeke nû hat destpêkirin, lê detayên vê pêvajoyê çi ne, hîne ji raya giştî re nehatiye gotin. Çekdayîna PKK'ê ne tê wateyê ku Kurd çekên xwe pê biparêzin deyînin û aliyên vê bangê jî dikin, mirov ji wan bipirsê ka bê çekbûn tê çi watê.
Niha du alî an du xet û nêrîn derketine holê û mirov dikare wan aliyan bi vî awayî bi nav bike; Aliyek nîqaşa bila PKK'ê bi ya Abdullah Ocalan bike, divê çekan deyîne, divê xwe fesix bike û biqede û ev jî aliyên ku ser bi dewletê ve ne an jî ser bi PDK'ê ve ne û di serî de Meisûd, Nîçirvan û Mesrûr Berzanî ne. Ev alî nabêjin ku vaye Ocalan ev bang kir û gavek avêt, ka bila dewleta Tirk jî gavekê bavêje, lê dixwazin bar hildin ser milê PKK'ê û di demekê de kêr li ser stûyê Kurdan e, PKK'ê hema çekan deyîne. Her wiha nêrîna aliyê din jî ew e ku şertûmerc pêk nehatine û nabe ku çek werin danîn û dixwazin bibêjin rêber Apo negotiye bila PKK'ê çekan deyîne û danîna wê ya çekan jî bi şertê pêkanîna mercên wê ve girêdayîye. Niha ew ê PKK'ê çekan deyîne an na, ev biryareke ku Rêveberiya vê rêxistinê dide û ew li gorî şert û mercên xwe dikare tevbigere, lê ev şirove û nîqaş di dema niha de Rojava eleqeder nakin û li gorî min, ne di cih de ye aliyên ser bi tevgerên Siyasî û leşkerî li Rojavayê Kurdistanê xwe bixin vê navberê. Ji xwe Rêber Apo ji bo Rojava jî ji bo parçeyên din jî berê gotibû ku her aliyek divê li gorî şertûmercên cihê lê ye tev bigere û siyaseta xwe diyar bike.
Ya ji tevgerên siyasî tê xwestin ew e ji miletê xwe re bibêjin ka çi diqewime û wê dema pêş de pêvajo ber bi ku ve biçe da di mêjiyê wan de rewş zelal bibe. Miletê Kurd ne xeşîmê rewşê ye û ew ji bo şer jî amadebûye û ji bo aştiyê jî destek daye, lê çav li berpirs û rayedaran da fêm bike çi diqewime.
Divê mirov xweşbîn be ji bo dema pêş û bi hêvî be ji bo rewşê, ji ber yê siyast dike rêber Apo û yê nexşerêya Kurdan diyar dike ew e. Belkî dewleta Tirk bi rengekî taktîkî li vê rewşê dinêre û wiha hesab bike ew ê heta firsendê bibîne û di carekê de êrişî Kurdan bike. Lê wer xuyaye rêber Apo berovajî dewletê bi rengekî stratejîk li meselê dinêre û firseta dawî dide, da mesele bê zirareke hîn mezintir li hemû aliyan bibe, çareser bibe. Yanî hemû alî bê zirar ji niha û pêve ji nava vî agirî derkevin saxlemiyê.



# ANHA; 12 sal in ku ji heqîqetê re rêwîtiyê dike

Ajansa Nûçeyan a Hawarê (ANHA) 12 sal in rêwîtiya xwe di nava têkoşîn, ked û berxwdanê de ye, da ku bi xebatên xwe yên pîroz rastiya ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û li cîhanê diqewime ragihîne. Di encama vê rêwîtiyê de 6 xebatkarên ANHA'yê şehîd ketin û bûn pêşeng ji bo xeta Ragihandina Azad.

**Ayşa Silêman/ Qamişlo**

Ajansa Nûçeyan a Hawarê wekî danehева têkoşîna rizgariya Kurdistanê û gihandina azadiyê ye. Ajansa Nûçeyan a Hawarê di 1'ê Adara 2013'an de hatiya avakirin. Navê xwe ji rojnameya Hawar a ku yek ji pêşengên Tevgera Azadiya Kurdistanê û Ragihandina Azad Mezlûm Dogan ku di zindana Amedê de derxistibû, girtiye dest.

### Avabûna Ajansa Hawarê

Dema ku li Rojhilata Navîn buhara gelan destpêkir, ANHA jî bi destpêkirina şoreşa gelan ya 19'ê Tîrmehê re hat damezrandin. Herwiha bi destpêkirina Şoreşa 19`ê Tîrmehê re jî, ji bo şopandina keşedan û bûyerên siyasî, leşkerî û meydanî li Rojava erkeke girîng girte ser milê xwe û roleke mezin lîst. Di demekê ku di herêmê de rê û rêbazên ragihandinê tune bûn ku hişmendiya hegomonîk û desthilatdar ragihandin bi awayekî mezin reş û berovajî dikirin, di heman demê de agahiyên ne rast didan civakê. Lewra pêwîstî bi avakirina ajansa ANHA hebû, ji ber ku ANHA hewl da ku li hemberî vê yekê di qada ragihandinê de bibe dengê rastiyê û tevlî têkoşînê bibe û civakeke axlaqî û politîk ava bike. Armanc ji avakirina Ajansa ANHA ew bû ku têkoşîna di




qada ragihandinê de tê kirin, yek ji rêbazên têkoşînê ji bo xurtkirina rêgezên jiyanê û avakirina kesayeta civaka axlaqî û politîke ku hemû deng, reng, bawerî, nêrînan qebûl dike û avakirina civakeke demokratîk pêş bixe.

### Kar û xebatên Ajansê

ANHA bi 7 zimanan weşana xwe dike; bi zimanê kurdî, erebî, ingilîzî, farisî, turkî, ispanî û rûsî. Bê guman Ajansa ANHA dikarîbû bibe cihê rastiyê û baweryê li cem gelê Bakur û Rojhilatê Suriyê, Rojhilata Navîn û cîhanê. Ajansa ANHA bi avabûna xwe bû çavkaniya rastiyan û li hemberî hişmendiya ku netew û jin înkar dike bû dengê rastiyê û her dem li ser şopa şehîdên doza azadiyê û dengê rastiyê meşiya.
Bi şoreşa Rojava re û bi şoreşa jinê ya 19'ê Tîrmehê re, Ajansa ANHA hewil da ku dengê şoreşê bighîne tevahî cîhanê. Di nava ajansa Hawarê de jin jî xwedî cihekî taybete û di amedekirina nûçe û babetên heyî de muhra xwe lê dide. Li Rojava Ajansa ANHA bû mîna dibistanekê ji bo hemû rojnamevanan û ji bona gelek rojnamevanan bû çavkaniya perwerdeyê. Ajansa ANHA şer, êriş, berxwedanî û jiyana gel ji hemû milî ve, kêlî bi kêlî dişopand û ji bona tevahî cîhanê radigihand. Di nava hemû şert û mercên zor û zehmet de ajansa ANHA kar û xebat dida meşandin û ji bona xwe gihandina rastiyan gelek şehîd û birîndar dan. Helbet ji bo civakekî şoreş ne bi hesanî tê ava kirin û di heman demê de rojnemevantî jî ne hêsan bû. Jin ji ber hişmendiya Sistema mêrê serdest her tim hatiye kolekirin û tu derfet jêre nehatiye dayîn ku cihê xwe di nava civakê de bigre û bibe xwedî îrade. Lê bi derketina tevgera azadiyê re û bi saya ramanê Rêber Apo îro di hemû warên jiyanê de bûye xwedî rol û cihê xwe di eniya pêş de digre.

### Mûma riya azad

Heta niha 6 endamên Ajansa Hewarê dema ku êriş, şer û binpêkirinên dagirkeirya tik û çeteyên wê û êrişên çeteyên DAIŞ'ê li ser herêmê bişopînin û berxwedana gelên herêmê li hemberî van êrîşan ji cîhanê û raya giştî re ragihînin şehîd ketin.
Hertim dagirkerî dengê rastiyê dike hedef û dixwaze giryarên xwe yên qirêj veşêre, lê li hemberî van êrîşan jî, berxwedanî û fedekarî berdewame. Şehîdên ajansa ANHA yên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê şehîd ketine; Dilîşan Aîbiş, Hogir Mihemed, Rizgar Denîz, Seyd Ehmed, Isam Ebdulah û Cîhan Bilgîn.
Ajansa ANHA wê her tim li ser şopa heqîqetê bimeşe û wê doza rêhevalên xwe yên rojnamevan bişopîne û nehêle ku pênûs û kamîreya wan li erdê bimîne.

# 'Bi rihê şerê gel ê şoreşgerî em ê parastina welatê xwe bikin'

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

**Berdevka Jinên Ciwan a Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê, Sara Hesen diyar kir ku dema Rêveberiya Xweser seferberiya giştî ragihand ciwanên herêmê bi rihê Şerê Gel ê Şoreşgerî tevlî seferberiyê bûn û got, "Em weke ciwan ji bo parastina nasname û welatê xwe tevlî seferberiyê bûn."**

Piştî ku Rêveberiya Xweser seferberiya giştî ragihanid hemû ciwanên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê erk û berpirsyariyeke mezin girtin ser milê xwe tevlî seferberiyê bûn. Herwiha dema ku dewleta Tirk û çeteyên wê di 8'ê Berfenbara 2024'an de êrişî Bendava Tişrînê kirin ciwanên herêmê berê xwe dane bendavê ji bo ku destekdayîn û piştgirtiya şervanên QSD'ê bikin. Di derbarê tevlîbûna ciwanan ji bo seferberiya giştî ya ku Rêveberiya Xweser ragihandî Berdevka jinên ciwanên Partiya Yekêtiya Dîmokratîk PYD'ê, Sara Hesen ji Rojnameya me re axivî.

### 'Bi rihê şerê gel ê şoreşgerî em ê parastina welatê xwe bikin'

Sara Hesen da zanîn ku dema Rêveberiya Xweser seferberiya giştî ragihand ew tevlî seferberiyê bûn û wiha got: " Em weke Ciwanên Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD'ê, ji bo ku em bi erkê xwe rabin û parastina axa xwe bikin, em tevlî seferberiya giştî bûn. Ji bo ku em piştgirtiya şervanên xwe yên di çeperên şer de jî bikin em tevlî berxwedana Bendava Tişrînê bûn. Herwiha di vê rewşê de em ciwan, me bi roleke bingehîn lîst, ji ber ku em li her cihî parastina axa xwe dikin. Ev dema hebûn û tunebûnê ye, ji ber vê yekê me xwe da diyar kirin û em tevlî seferberiyê bûn. Ji ber ku qirkirina siyasî û leşkerî li ser me tê meşandin. Di vê demê de dijmin şerê derûnî li ser gelê me dide meşandin û dixwaze bi riya şerê derûnî coşa gelê me bişkîne, herwiha li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giştî gelek komên ciwan tevlî seferberiyê bûn û niha gelek ciwan di çeperên şer de cihê xwe girtin û berxwedaniyê dikin."

### 'Dîrok ji nû ve li Bendava Tişrînê tê nivîsandin'

Sara Hesen anî ziman ku li ser asta herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ciwan tevlî seferberiyê bûne û wiha domanid: "Seferberî ne ew e, ku her kes cihê xwe di çeperên şer de bigre, seferberî gelan birêxistin dike. Di heman demê de ciwanên me li Bendava Tişrînê destekdayîn û piştgirî ji bo şervanên di çeperên şer de dikin û heta niha jî ev piştgirî berdewam e. Herwiha ciwan xwe li ser bingehê şerê gelê şoreşgerî xwe birêxistin dikin û di vê pêvejoyê de şerê gelê şoreşgerî hat xuya kirin. Me gelek civîn ji bo ciwanan çêkirin ev civîn li ser pişgirtiya ciwanan ji bo şervanên QSD'ê bûn û civînên me berdewamin. Rêber Apo dibêje bi ciwantiyê me destpêkir û bi ciwantiyê em ê bi ser bikevin û li ser vî bingehî em ê bi ser bikevin. Niha di vê demê de ji aliyê ciwan û şervanan ve li



bendava Tişrînê berxwedaniyeke bêhempa tê meşandin û dîrok ji nû ve li Bendava Tişrînê tê nivîsandin."

### 'Pêwîste hemû ciwan tevlî seferberiyê bibin'

Berdevka jinên ciwanên di Partiya Yekêtiya Dîmokratîk PYD'ê de Sara Hesen axaftina xwe wiha bi dawî kir: " Di vê rewşa herêmê de barê herî giran li ser milê jin û bi taybet ciwana ye, ji ber ku dewleta Tirk êrişî xeta jin û ciwanan dike. Herwiha êrişên dewleta Tirk a dagirker tucarî nikare coşa me bişkîne û em ê heta dawiyê berevaniyê di ber axa xwe de bikin û parastina rûmeta xwe bikin. Banga me ew e, ku hemû ciwan tevlî seferberiyê bibin, parastina nasname û welatê xwe bikin."

FENER



## Berpirsiyariya Dîrokî Xurtkirina Destê Rêber Apo Ye

**Idrîs Henan**

Çawa ku Rêber Apo di dema şerê çekdarî de mezintirîn têkoşerê azadî û demokrasiyê bû, îro jî bi banga xwe ya aşîtî û civaka demokratîk re, gewretirîn aşîtîxwaz û têkoşerê azadî û demokrasiyê ye.
Rêber Apo di vê peyama xwe de carek din isbat dike ku sedema pirsgirêkê zihniyeta Tirk ne têkoşîna adilane ya gelê Kurd e. Lewre, eger mesele guhertina rêxistinî be, wê çaxê em ji bo guhertina şêwaz û amûrên guhertina demokratîk amade ne, lê hîcar hûn amade ne niyetên xwe yên stratejîk beramberî doza Kurd eşkere bikin?
Ji bona ku daxwazên peyama Rêber Apo bi cih werin, pêwîstiyek lezgîn bi guhertina zimanê nêzîkatiyê heye. Ji ber vê jî divê ev peyama weke metna destpêkê were dîtin ku pêwîstî bi hinek gerantî û gavên siyasî, hiqûqî û demokratîk heye. Girîngiya vê bangê xwe dispêre baştêgihaştina guherînên cidî yên li herêmê rûdidin û hewcedariya stratejîk a guhertina şêwazê têkoşîna demokratîk ku pabendê geşedanên sedsala bîst û yekan be. Ango; cilên heya roja îro hatine lixwekirin, êdî teng bûne û pêdiviyek lezgîn bi guhertinê heye.
Bê guman aliyek din a banga Rêber Apo ew e ku; behsa civaka demokratîk a rê li ber şerê demdirêj digire dike. Ev yek jî isbat dike ku êdî têkoşîna Kurdan bi encam dibe ku kirasê înkarê çirandiye. Ji ber vê jî; ev pêvajo ne prosesek gav paş de avêtin e, tam berovajî wê yekê, gavên mezin ên ber bi tekûzkirina zaferê ne. Ji xwe hêza têkoşîna ku Kurdan raber kiriye, bi nêzîkatiya dewleta kûr a Tirkiyê û destavêtina wê ji Rêber Apo re diyar bûye. Çawa ku dunya ne weke sedsala berê ye, Kurd jî ne Kurdên berê ne. Ji bona ku teoriya Kurd û ideolojiya wî ya têkoşîna serkeftî li gorî sedsala nû be, Rêber Apo têkoşînek bê hempa daye meşandin ku bi salan li ser teoriya wê xebitiye. Ji ber vê jî hemû nirxandinên piştî xwendina peyama Rêber Apo derketine, hemfikir in ku Rêber APO bi peyama xwe firsendek daye duyemîn sedsala komarê ku bi awayekî demokratîk bi ser keve û dest ji rêbazên sedsala yekemîn ku nedikarî pê ti qezencê bi dest bixe, berde.
Çawa daxuyanî destpêk bû, êdî dor lê hatiye ku dewlet jî hinek gavên tetmînatê yên têkoşîna civaka demokratîk biavêje û ji bona aşîtiyek mayînde bilebite.
Her wiha pêwîste him dewlet û him jî Kurd, di van rewşên kirîtîk û hestiyar de, dev ji hesabên kî bi ser ket û kî bi bin ket, berdin û nedin pey gotinên vala û porvakatîf ku dixwazin pêvajoyê sabote bikin. Çawa ku Rêber APO bi daxuyaniya xwe arguman ji destê dewletê derxist, divê civaka Kurd jî destê Rêber Apo yê aşîtî û demokrasiyê xurt bike û bi awayekî lezgîn pêdiviyên vê qonaxê, bi Rêber APO re, bi cih bînin ku banga wî weke peyameke ji bo çareseriya ku dê serkeftinê bi xwe re bîne, were hembêzkirin.
Êdî li holê belgeya destpêkê ya pêvajoyeke çareseriya aşîtiyane heye, lew re divê şert û mercên dîzaynerê vê projeyê werin guhertin û Rêber APO serbest bibe ku bi azadî vê pêvajoyê bi rê ve bibe. Her wiha divê dewlet jî dest ji netewperestiya xwe ya hişk berde û dest bi xebatên guhertina destûra bingehîn bike û gevên hiqûqî, siyasî û demokratîk biavêje. Êdî gok li gel wê ye.
Pêwîste şiklê berpirsyariya hestiyar û stratejîk a ku Rêber Apo girtiye ser milê xwe baş were fêmkirin ku encamên derkevin, wê dîrokî û bi salan dewam bikin. Ji ber vê yek jî, peyama Rêber APO dîrokî ye. Gelê me jî di wê ferqê de ye ku rengê pêşwazîkirina wî ji peyama Rêber Apo re, asta baweriya wî ya mutleq bi fikrên Rêber Apo re diyar dike. Berpirsiyariya dîrokî jî ew e ku; pêvajo were nirxandin û naveroka wê jî ji gelan re bête ravekirin.